Azadîa rastî çi ye?

Babê min miruvekî "xwê" u "runahî" ye. Her dem ew ḧeş Xwidê dikit u xizmeta xelkê daî ye. Ew guhê xu didite fermanêt Xwidê u wan nîşa me (biçîkêt wî). Jîan u peyvêt wî nîşa me dit çi li dilê wî bî. Rojekê wextê ew dimirit u diçite biḧeşta Xwidê, Çêkir u Dadkarê wî dê bêjit wî: "Te karek baş kirî ye, ey xulamê qenc."

Di demê nivîsandina vê jimara "Jîn", tengavîek bu mala min çê bî: ji nişke kê ve u gelek zî seḧeta babê min xirab bî. Dest u pê wî yêt rastê nîv şelelê girtin u axiftina wî u hizira wî ne zelal bîn. Me gut belkî celta mejî heye u me bawer kir ew hêş dê nexuştir bit. Temenê babê min 69 sal e, bes tebî'î gelek bi qowet bî u zîrek bî u seḧeta wî baş bî. Li wî demê wî ne şîa timbêlê bihajut, ne şîa şul bikit u ne şîa baş biaxivit. Wî ne şîa xizmeta xelkê bikit; belê miruvêt wî u hevalêt wî pêtivî bîn xizmeta wî bikin. Çunku behira pitir ji azadîa wî ne ma.

Deyk u babêt min çûn def rêberêt dêra xu. Rêbera du'a bu qencbûna babê min bi navê Dixturê Mezin ('Îsaê Mesîḧ) kir.

Dumahîkê deyka min babê min bir xestê u dixtura brîar dan 'emelîata mejî bu babê min bikin. We dîar e ji berî dû heyva bi xeletî ve li tiştekê req ḧêl li serê xu da u di jur ve birrî ḧeta xwîn deh ji seda mejîê wî girêda. U ji ber hindê dest u pê wî yêt rastê şelel girtin u axiftina wî ne zelal bî. Nuke em supasîa Xwidê dikîn, 'emelîat serkeft u babê min qenc bî. U wextê ji pencê rabî, yarî gel sister u mizemida kir!☺

Ewilî min u mala xu bawer dikir babê min dê mirit yan da bi seḧeta xirab jît. Belê me bu wî du'a kir u bi çakî u diluvanî ya Xwidê u bi destêt dixtura, Xwidê dîarîêt seḧeta baş u azadîê da babê min ve.☺ U demê nêzîkî ew carek dî dê şêt xizmeta miruva bikit u karê xu bikit u bizava xu bizivirrite ve.

Jîana te wek zirufîê ya babê min e. Li sala 1991 dîarîa azadîa sîasetê bu we hate dan u ḧeta nuke hîn di wê azadîê dane. Hîn sîstema zanînê yê digihurin. We internet u mobayl înan bajêr u gundêt xu. Xwêndikarêt we çûn derveî welatî da bixwînin. Hindek ji malêt we yan miruvêt we mihacir bîn derveî welatî u tama dîmokrasîa welatêt Rojava kir. Belê, hindek ji we cinsîêt wan welata bu xu wergirtin.

Hîn azadîê bi çend şikila hatin dan. Ka em bi wê azadîa Xwidê daî me çawa kar pê tînin? Bu armanceka baş, anjî armanceka xirab?

Bîne bîra xu:

"Ew kesê gelek wergirtî dê gelek jê ête xwastin, belê yê gelek zîrek u wergirtî li def bite danan dê pitir jê ête xwastin." - 'Îsa (Mizgînîa Luqaî 12:48b)

© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.